SÎSTEMA PIŞTGIRIYÊ YA TUNDKARIYA CINSÎ LI KU YE ?

csdestek.org

AGAHDAR BE

Derbarê malperê de

Tundkariya Cinsî; Wateya wê, cûreyên wê, têgeh

Baweriyên şaş û rastiyên wan tiştan

Pirsên ku herî zêde tên kirin

Beşa Agahdar Be; hûn dikarin zanyariyên derbarê wateya tundkariya cinsî, şêweyên tundkariya cinsî û têgeh û wateyên derbarê tundkariya cinsî de bidest bixin. Her weha hûn dikarin zanyariyan derbarê tiştên şaş ên ku civak derbarê tundkariya cinsî de dizanin û rastiyên wan bixwînin û bersiva pirsên ku pir tên pirsin bibînin.

PÊVAJOYÊN SERLÊDANÊ

"Min biryar da ku ez gilî bikim..."

Cihên serlêdanê

"Tundkarîya cinsî li min hate kirin..."

Beşa Pêvajoyên Serlêdanê; di vî beşî de gavên ku tê piştî tundkariya cinsî an jî êrîşa cinsî bavêjin hene, her weha hin zanyarî tê de hene ku wê hin alternatîfan nîşanî te bidin. Ev zanyarî ne tenê derbarê pêvajoya agahdarkirina tundkariyê de ye. Biryara serlêdanê biryareke şexsî ye û şert û merc û dudiliyên herkesî yên piştî tundkariyê wê cida cida bin. Biryara te ya ji bo gilîkirinê her çi dibe bila bibe feqr nake, tê di vî beşî de wan zanyariyan bibîne ku tê bikaribe ji ku û çawa bi dest bixe. Ew prosedurên tibî û yên yasayî yên di vî beşî de ji bo kesên ku temenê wan 18 û berjortir e.

NEXŞEYA NAVENDÊN LI STENBOLÊ

Derbarê Nexşeyê de

Tê nexşeyê çawa bikar bîne?

Nexşeyê Bibîne

Xetayan ji me re binivîsîne / Navendan li nexşeyê zêde bike

Nexşeya Navendên Li Stenbolê; di vî beşî de hûn dikarin navnîşanan, hejmarên telefonan, saetên karkirinê yên sazî û navendên ku piştî tundkariya alîkariyê didin bibînin. Her weha zanyariyên xizmetên ku didin jî hene. Di nexşeyê de navendên hiqûqê, navendên tenduristiyê, navendên hizmetguzariya civakî, navendên emniyetê û navendên ku bi rêya telefonê xizmetê didin hatine nivîsandin. Li Stenbolê hin zanîngehan ji bo karmend û karkerên xwe navendên serlêdanê yên êrîşa cinsî/tacîza cinsî vekirine. Di vê nexşeyê de derbarê van navendan de jî zanyarî hene. Di nexşeyê de hin filtre hene û hûn dikarin li gorî van fîltreyan li tiştên ku dixwazin bigerin. Ew navendên ku xizmetê didin, hûn dikarin li gorî navçeya navend lê ne, cûreyên xizmeta ku didin, li gorî saetên ku kar dikin hilbijêrin. Her weha hûn dikarin vê lêgerînê li gorî wî tiştî jî bikin ku bê ka çi cure xizmetê ji bo tundkariya cinsî didin. Hûn dikarin xwe bigihînin wan navendên xizmetê yan jî yên piştgiriyê ku li gorî zarokparêziyê, LGBTİ+parêziyê, penaberparêziyê, kêmendamparêziyê, jinparêziyê û ajalparêziyê xizmetê didin.

ALÎKARIYA XWE-BIXWE

Alîkariya xwe-bixwe çiye?

Pêvajoya naskirin û watedayînê

Pêvajoya Têkbirinê û Şîfadîtinê

Beşa Alîkariya Xwe-Bixwe; di vî beşî de zanyariyên derbarê alîkariya ku tê bi xwe bide xwe heye. Ev alîkarî piştî tundkariya cinsî wê di pêvajoya şîfadîtinê/selametiyê de alîkariya te bike. Dema tu bixwazî alîkariya te yan jî xizmeke te bê kirin tu dikarî li vê beşê zanyariyan, pêşniyaran û egzersizan peyda bike. Zanyariyên li vir hatine nivîsandin ji bo her wan kesan e ku ji ber her cure tundkariyê filitîne. Helbet serpêhatiyên kesî ji yên din cida ne. Ji ber wê ye ku dema we ev tişt xwendin hûn dikarin serpêhatiyên nêzîkî serpêhatiya xwe bifikirin û bala xwe bidin pêşniyarên ji bo we wê bikêr bên.
Sebir, hewldan û wêrekî ji bo pêvajoya şîfadîtinê ya piştî tundkariya cinsî divê.

ÇAVKANÎ

BERÊ MIN BIDE HÊLEKÊ

REWŞÊN JI BO PIŞTGIRIYA BILEZ Û BEZ

Heke ku hûn nizanibin bê ka di malpera **csdestek.org**-ê de çi zanyarî ji bo we pêwîst in, hûn dikarin li nivîsa BERÊ MIN BIDE HÊLEKÊ ya li ser rûpela pêşîn bitikînin. Hûn ê di vî beşî de bikaribin bilez û bez wan zanyariyan bidest bixin ku derbarê tundkariya li we hatiye kirin wê ji we re hewce bikin.

Hejmarên telefonan ên saziyên netewî ku di demên tundkariyê de bilez û bez wê bikaribin li Tirkiyeyê alîkariyê bidin we, dema hûn nivîsa REWŞÊN JI BO PIŞTGIRIYA BILEZ Û BEZ bitikînin wê derkevin pêşberî we.

Di beşa ÇAVKANIYAN de lînkên vîdeo, buroşur û hin materyalên din ên nivîskî û dîtbarî yên bi tirkî û bi jêrnivîsa tirkî hene. Dibe ev çavkanî yên saziyên dewletê (weke malpera ji bo mafên mexdûran a Wezareta Dadê) yan jî yên saziyên civaka sivîl bin. Hûn jî dikarin di beşa TÊKILÎDANÎNê de çavkaniyên pêwîst pêşniyar bikin.

MALPERA CSDESTEK.ORG-Ê YA SÎSTEMA PIŞTGIRIYA TUNDKARÎYA CINSÎ LIKU YE? JI BO KESÊN TUNDKARÎ LI WAN BÛYE HATIYE AMADEKIRIN.

Li gel zanyariyên derbarê serlêdanê yên piştî tundkariya cinsî û tundkariyê, li ser csdestek.org-ê zanyariyên derbarê alîkariya xwe-bixwe yên di dema lêgerîna şîfadîtinê de jî hene.

Her weha li ser malpera csdestek.org-ê hûn dikarin "Nexşeya Navendên Piştgiriyê yên li Stenbolê" bibînin. Di vê nexşeyê de zanyarî derbarê wan saziyan de hene ku piştgirî û xizmetê didin kesên rastî tundkariyê hatine û jê filitîne.

HÛN DIKARIN DI MALPERA CSDESTEK.ORG-Ê DE LI SER NEXŞEYA NAVENDÊN STENBOLÊ ZANYARIYÊN BERFIREH Û JIMARÊN TELEFONAN ÊN SAZIYÊN EDLÎ, NAVENDÊN KARÛBARÊN CIVAKÎ, SAZIYÊN CIVAKA MEDENÎ, SAZIYÊN TENDURISTIYÊ Û NAVENDÊN EWLEHIYÊ Û NAVENDÊN ZANÎNGEHAN BIDEST BIXIN.

"KÊ TUNDKARÎ KIRIBE Û TÛNDKARÎ ÇAWA PÊK HATIBE FERQ NAKE, EW NE XETAYA MIN E. SÛCÊ WÎ KESÎ YE KU TUNDKARÎ LI MIN KIRIYE..."

Ya girîng ew e ku divê tu bizanibî ku tu ne bi tenê ye û hin kesên ku alîkariyê bi te bikin hene. Her wiha divê tu bizanibî ku bêyî te bidarizînin û te rexne bikin, sazî û derdorên alîkariyê bidin te hene.

"XURTIRÎN Û BIHÊZTIRÎN ALÎKARIYA PIŞTÎ TUNDKARIYÊ EW E KU TÊ XWE BI XWE BIKE..."

Her mirov ji tiştên cida cida hêza xwe distînin.

Dema te ferq kir bê pêwistiya te bi çi heye û ji bo te ya baş çi ye, te ew binav kir û daxwaz kir, ev destpêk e ji bo alîkariya ku tê bi xwe bike

"TÊ BI XWE BIRYARÊ BIDE BÊ KA TÊ GILÎ BIKE YAN NA..."

Heke te giliyê tundkariya li te hatiye kirin nekiribe, ev nayê wê wateyê ku bûyera tundkariyê ne rast e. Tenê bi cezakirina failan edalet pêk nayê, dema piştgiriya te bê kirin û tu xizmetên ku mafên te ne û pêwistiya te bi wan heye bi dest bixî, ew jî şêweyek ji pêkhatine edaletê ye.

BI QASÎ PIŞTGIRIYA HIN KESÊN DIN AN JÎ PIŞTGIRIYEKE PROFESYONEL, TU BI XWE JÎ DIKARÎ ALÎKARIYÊ BI XWE BIKE. TU DIKARÎ BI XWE JÎ PIŞTGIRIYÊ BI XWE BIKE. TU DIKARÎ JI XWE HEZ BIKÎ, LI XWE MIQATE BÎ. TU DIKARÎ RÊBAZÊN CURBECÛR ÊN ŞÎFADÎTINÊ BICERIBÎNE Û YA KU LI TE HAT TU HILBIJÊRÎ.

SÎSTEMA PIŞTGIRIYÊ YA TUNDKARIYA CINSÎ LI KU YE ?

Baweriya me bi kesên ji tundkariya cinsî filitîne tê, **hûn ne bi tenê ne..**

Association for Struggle against Sexual Violence

csdestek.org

Association for Struggle against Sexual Violence

www.cinselsiddetlemucadele.org

cinselsiddetlemucadele | cs_mucadele | cinselsiddetlemucadele dernegi

+90 542 585 3990 | info@cinselsiddetlemucadele.org